Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1214 20-Cotmeh-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# ‘Em bi çandiniya sebze û şînatiyên zivistanê aboriya xwe pêş dixin’

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Kantona Cizîrê bi ax û avhewaya xwe ya guncw ji bo çandiniya tê nasîn, bi taybet çandiya sebzeyan li pêş e û rêjeyeke mezin ji cotkaran zeviyên sebzeyan bi rûbarekî mezin diçînin. Cotkar di dema niha de bi rêya çandina sebze û şînatiyên zivistanê debara jiyana xwe dikin, aboriya civakê li pêş dixin û xwemaliyê pêk tînin.**



Çandinî yek ji girîngtirîn xebata jiyanê ye, ji ber ku ji dirêjahiya dîrokê ve girêdana gel û bi taybet jin bi axê re heye û bi çandiniyê ve mejûl dibin. Karê çandiniyê dibe çavkaniya jiyana wan û debara mala xwe pê dikin. Her wiha kedeke mezine dixwaze da ku bighêjin berhemên bi sûd û herî baş. Têkildarî mijarê çandina zebzeyên zivistanê yên Kantona Cizîrê xwediyê bexçeyekî Abdullah El-Ehmed û cotkara bi navê Rewaa Hisên ji Rojnemeya me re axivîn.

Abdullah El-Ehmed bal kişand ser girîngiya çandiniya sebzeyan ji bo



pêşxistina aboriya civakê û wiha got: “Ji bo çandiniya sebze û şînatiyan amedekirina axê hewce ye. Niha dema hin berhemên sebzeyên zivistanê ye. Aboriya me bi çandiniya sebzeyên cihêreng ên ku em ji bo zivistanê diçînin xwirt dibe. Her wiha çandinî ne tenê ji bo peydakirina debara jiyanê ye, lê wekî projeyeke aborî ye ku bi wê dahatek baş peyda dikin.”

**‘Dema em berhemê keda xwe dibînin westandinê ji bîr dikin’**

Abdullah da zanîn ku sebzeyên zivistanê pir kedê dixwaze û hewcedarî bi simad, avdan û dermankirin ê heye û wiha got: “Bexçeyê me wekî mala me ya dûyemîne, em piraniya demên xwe bi mejûlbûna di nava bexçe de derbas dikin. Di xebatê çandiniyê de em bi gelek zehemetiyan re rû birû dimînin, lê em karê xwe didomînin bêyî ku em aciz bibin an jî dev jê berdin. Tevî ku hewaya sibehê pir sare jî em sibehê zû şiyar dibin û diçin nav zeviyên xwe û giyayê li dora sebze radikin, ji bo ku baş şîn bê. Em zeviyan avdidin û semad dikin, demê ku em dibînin sebzeyên me geş dibin û berhem jê digrin em hemû westandin û zehmetiyan jibîr dikin.”

**‘Karê çandiniyê li Cizîrê çavkaniyek sereke ya jiyanê ye’**

Abdullah El-Ehmed di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Di peydakirina semad û tovan de em zehmetiyan dikişînin, li gor vê jî em karê xwe berdewam dikin ji ber çavkaniya sereke ye ku pê debara malbatên xwe dikin. Çandinî li Kantona Cizîrê çavkaniya sereke ye, lewma tevî zehmetiyan jî em karê çandiniyê berdewan dikin tevî ku hin caran semad û av peyda nabe jî. Her wiha 2 meh piştî berhevkirina zebzeyên zivistanî, em dest bi çandiniya genim dikin. Em beşdarî cotkariyê dibin ji ber ku kar bi me ve girêdayî ye. tenê bangewazî û daxwze me ew e ku Rêveberiya Çandiniyê ji tevahî cotkaran re mazot peyde bike û bibe alîkar, da ku em hemû cureyên zebzeyan li ser axa xwe biçîninh û em hewcedarî bajarên derve nebin. Ji ber ku axa Cizîrê axakî zengîne.”

**‘Kêmbûne mazotê bandorek neyinî li çandiniyê dike’**

Di heman demê de Cotkara bi navê Rewaa Hisên ku roja xwe bi xebata çandiniyê dest pê dike û wiha dibêje: “Em tov ji sûkê dikirin an em ji berhem hiltînin û piştî ku em erdê ji bo çandiniyê amade dikin û ji giha paqij dikin, em zebzeyê zivistanê diçînin, pêdiviya zebze yan zivistanê jî bi avdanê heye. Ji ber vê niha em zehmetiyan dikşînin ji aliyê mazotê. Dema av kêm bibe wê hemû bexçeyên me bişewitin û hişik bibin. Em bi hêvîne ku saziyên aleqadar bibin alîkar û destek, da ku zebzeyên herêmê bi rengekî baş û saxlem derkeve.”



# Bi hingivê xwe dibin derman ji nexweşiyan re

**Sebha El-Xerbî û hevjînê xwe nêzî 30 salan e bi hev re mêşên hingiv xwedî dikin. Li ser karê ku dikin destnîşan kirin ku xwedîkirina mêşên hingiv karekî zehmet e lê xweş e û gotin ku hingiv ji bo gelek nexweşiyan derman e.**



Hingiv, yek ji xwarinên bi tendurist û sûdwar e. Di dermankirina gelek nexweşiyan de tê bikaranîn. Ji ber wê projeya xwedîkirina mêşên hingiv serkeftî ye û qezenca wê baş e lê her kes nikare mêşên hingiv xwedî bike. Sebha El-Xerbî û hevjînê wê Mihemed Sebrî, xwediyên mêşên hingiv in ji şêniyên gundê Til Necma yê girêdayî navçeya Til Temirê ne. 30 sal berê bi hev re dest bi vê projeyê kirine û heya roja îro berdewam dikin. Sebha El-Xerbî û hevjînê wê ji 3 kewaran dest bi vî karî kirine û bi demê re kewar zêde bûne, niha 52 kewarên wan hene.

**‘Xwedîkirina mêşên hingiv ked û hesasiyetê dixwaze’**

Sebha El-Xerbî diyar kir ku xwedîkirina mêşên hingiv ne hesan e û ev tişt anî ziman: “Ji bo em bikaribin mêşên hingiv xwedî bikin kedek û hesasiyetek ji vî karî re pêwist dike. Ji dema ku me dest bi vê projeyê kiriye ve heta niha me derman ji wan re dikirî û her dem em cihê wan diguherînin da ku xwarinê bixwin. Li kuderê bexçe hebin, di demsala zebeşan de me wan dixist erebeyekê û li wir bi cih dikir da ku bikaribin baş bixwin û hingiv çêkin. Di salê de hingiv du caran tê derxistin; yek di meha 6’an de, ya din di dawiya meha 8’an de. Niha li gel me 4 kewar hene ji bo xwezêdekirinê lê yên din hemû ji bo hingiv in. Dema em hingiv derdixin yan jî wan derman dikin em cilên taybet li xwe dikin û ez û hevjînê xwe bi hev re dibin alîkar.”

**Ji 3 kewaran bû 52 kewarên mêşên hingiv’**

Sebha El-Xerbî di berdewama axaftina xwe de wiha anî ser ziman: “Mirov ji hingiv sûdê digre bi taybetî di aliyê nexweşiyan de. Hingivê me, xwezayî ye ji bo nexweşiya şekir jî derman e. Em mêşan xwedî dikin da ku ji wan sûdê bigrin û bibe dermanê nexweşiyan. Kesên ku em dibînin nikarin bikirin û ji bo nexweşiyan ji bo wê pêwîst e em bibin alîkar. Ez wekî jinek pir ji xwedîkirina wan hez dikim û ji wan fam dikim bi hesasiyet ez li wan miqate me û wan xwedî dikim.”

**‘Hingiv ji bo her nexweşiyê derman e’**

Mihemed Sebrî jî da zanîn ku projeya mêşên hingiv serkeftî ye lê zehmetiyê di firotina wê de dibînin û wiha got: “Ruxmî şert û mercên dijwar ên ku herêm tê re derbas dibe jî em ji dev karê xwe bernadin û gelek cureyên mêşan xwedî dikin. Ji wan ên herî navdar mêşên Îtalî, Sûrî, hemewî û hwd. in. Ruxmî ku hingiv dermanê her nexweşiyê ye lê kes piştgirî nade xwedîkirina mêşên hingiv. Em zehmetiyê di peydakirina dermanan û firotina hingiv de dikşînin. Gere cihekî taybet ji bo kirîna hingiv were çêkirin. Xwedîkirina wan jî ne hesan e û em gelek ked û mesrefê jî li wan dikin.” **NÛ JINHA**

Sudoku: Bersiv 10

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 6 | 5 | 1 | 9 | 8 | 3 | 4 | 7 |
| 7 | 8 | 4 | 2 | 5 | 3 | 1 | 6 | 9 |
| 3 | 9 | 1 | 4 | 7 | 6 | 2 | 8 | 5 |
| 4 | 5 | 3 | 7 | 2 | 9 | 8 | 1 | 6 |
| 9 | 1 | 6 | 3 | 8 | 5 | 7 | 2 | 4 |
| 8 | 7 | 2 | 6 | 1 | 4 | 9 | 5 | 3 |
| 1 | 4 | 8 | 5 | 3 | 7 | 6 | 9 | 2 |
| 5 | 3 | 9 | 8 | 6 | 2 | 4 | 7 | 1 |
| 6 | 2 | 7 | 9 | 4 | 1 | 5 | 3 | 8 |

Sudoku:Pirs 11

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | | | | | 6 | | |
| | | | | 6 | | | | |
| | 9 | | | | 2 | 3 | 4 | |
| 6 | | | 5 | | | 8 | 1 | 4 |
| | 1 | 2 | | | | 7 | 6 | |
| 7 | 4 | 5 | | | 1 | | | 3 |
| | 8 | 3 | 1 | | | | 9 | |
| | | | | 9 | | | | |
| | | 1 | | | | | 7 | 6 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ser serê xwe û heft bavê xwe razî ye:**
- Pir bi dilê wî ye.

**Sivorî li ser simbêlên wî dilîzin:**
- Keyfa wî pir li cih e; keyfa wî di dereceya herî jor de ye.

**Şûr simbêlên wî nabirrin:**
- Bi heman wateyê.

**Ti kesî destê camêran negirtiye:**
- Ku tu bikî bike; ti kes nabêje te neke. )Dema yek dibêje; ezê tişteke baş bikim derbarê wî de tê gotin(

**Tir xwe di şalê wî de nagirin:**
- Keyfa wî pir li cih e.

**Weke koçerê penîrê ter bibîne:**
- Keyfa wî pir hat.

**Weke sêwiyê çav bi hêka sor ketî:**
- Keyfa wî pir hat; ji keyfa nizaniya ka çi bike.

**Xaniyê min ronahî bû:**
- Ezîzekî min hat malê.

**Xwe dixwe:**
- Pir keyfa wî tê.

**Xwîn hat rûyê wî:**
- Keyfa wî pir xweş bû.

**Zebeşek di devê wî de bi cih dibû:**
- Pir bikeyf bû.

**LI SER CIWANÎ Û BEXTIYARIYÊ**

**Bayê xortan gurr e:**
- Ji bo xurtbûn û zindîbûna xortan tê gotin.

**Beng benga wî ye:**
- Di ciwaniya xwe de dijî.

**Di berbanga xwe de ye:**
- Nû gihatiye; li ser teng û benga xwe ye; bextiyar e; ciwan e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Desthilatdarî û Rêveberiya Demokratîk...(1)

Ji bo çareserkirina pirsgirêkên bingehîn ên civakî di diyardeya rêveberiya civakî de jihevkirina şêweyên desthilatdarperest û rêveberiyên xweser ên demokratîk gelekî girîng e.**R-4**



## ‘Fikrê Rêber Apo dikare cîhanê ji nû ve ava bike’

Birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Mihemed Ocalan diyar kir ku li hemberî sîstema işkence û qirkirinê ya ku li dijî Rêber Apo li Îmraliyê tê meşandin, pêwîste gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz rabin ser piyan.**R-5**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1214 20-Cotmeh-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## ‘Serêkaniyê parçeyek ji canê me ye’



Koçberên Kampa Serêkaniyê diyar kirin ku 5 sal in Serêkaniyê hatiye dagirkirin, 5 sal berxwedanî di bin şert û mercên herî giran û zehmet de tê kirin û gotin, “Axa me parçeyek ji canê me ye û em tu carî dev ji parçeyê canê xwe bernadin her wê bimîne cih û warê me.”**R-2**

## ‘Kenan Şêxo mîrasa Mihemed Şêxo vejand’




Hunermend Kenan Şêxo birayê biçûk ê hunermendê kurd Mihemed Şêxo ye. Bi dirêjahiya 10 salan xebata hunerî li Rojava û Başûrê Kurdistanê, hem jî li derveyî welat kiriye. Herwiha Biha Şêxo girêdayî Kenan Şêxo da zanîn ku Kenan bi deng, bejin û bala xwe mîna Mihemed Şêxo bû.**R-7**


# RIZGARKIRINA REQAYÊ TÊKBIRINA HIŞMENDIYA PAŞVERÛ BÛ

Di 17’ê Cotmeha 2017’an de şervanên QSD’ê bi pêşengiya YPJ’ê, piştî berxwedaneke dîrokî bajarê Reqayê ji pençên çeteyên DAIŞ’ê rizgar kirin û di 20’ê heman mehê de rizgarkirina bajêr ragihandin. Bajarê ku DAIŞ’ê kiribû navenda işkence, komkujî û kolekirina jinan, niha bûye sembola demokrasî, wekhevî û hevgirtina gelan. Jinên ku ji axaftinê bêpar bûn, niha bûne pêşengên civakê û di tevahiya qadan de cihê xwe digirin.**R-3**









## Êşa herî giran koçberiya di hundirê welêt de ye!




Koçberên li Kampa Waşûkanî di nav êş û zehmetiyan de jiyanê dewam dikin, êşa koçberan jî ne jiyana li nav konan e, lê birîna wan ew e ku di welatê xwe de bûne koçber. Di heman demê de koçberî bandoreke mezin li ser piskolojiya wan kiriye û ev yek hîn zorê dide jiyan wan.**R-6**



**Siyaset, Heqîqet û Dewlet(Bahçeli)**
Ahmet Aktaş R-4



**Eger Ne Eşkere û Fermî Be, Dolma Baxçeyek Nû Ye**
Idrîs Henan R-5



**Gurbûna şer û tirsa Tirkan**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

# Tevî têkoşîna jinê tundiya li dijî wê berdewam e

**Tevî ku li seranserî cîhanê asta têkoşîna jinan ya li dijî tundiyê gihiştiye asteke bilind, lê kuştin, revandin û tundî li dijî jinê jî di rêjeyeke pir metirsîdar de ye. Bi taybet li deverên ku şer û kirîz hene, rêjeya tundiya li dijî jinan pir bilind e.**

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Tevî bilindbûna asta têkoşîna jinan û pêşketina ku cîhan tê de derbas dibe, lê hîn jî diyardeya kuştin û tundiya li dijî jin û zarokan dewam dike.

### Ji sedemên kuştina jinan

-Tundiya malbat sedemeke sereke ye ji sedemên kuştina jinan, ji ber desthilatdariya di nava malbatê de û cudahiya di navbera her du zayendan de.
-Kuştina bi hincet û li ser navê şerefê di gelek civakan de belav e.
-Zewicandina bi zorê, gelek jin tên kuştin ji ber ku zewacê red dikin.
-Xizanî, şert û mercên aborî yên zehmet, ev faktor xeteriya tundî û kuştina jinan zêde dike
-Rewşa şer li dewletên ku pêvçûnan jiyan dikin, tê de jin li hember hovtrîn wesîleyên tundî û kuştinê tê, bi îstîsmara zayendî û êrîşên fizîkî û derûnî re rû bi rû ne.

### Ji ber redkirina zewacê gelek jin hatin kuştin

Di dema dawî de, ji nav rêzekuştinên ku li dijî jinan pêk tê, li Tirkiyê jineke ciwan bi nave Naya El-Sefan ji Sûriyê li ser destên ciwaneke Tirk hate kuştin, ji ber ku ne dixwest pê re bizewice.
Mîna vê bûyerê berî du salan li Misirê dûbare bû weke doza (Neyra Eşref) ji ber heman sedemê hate kuştin, di wê demê ev bûyer bû raya giştî û piştî salekê sûcdar hate darvekirin. Li Urdinê jî xwedndekareke bi navê Îman Arşîd ji hêla ciwanekî ku red kir pê re bizewice hate kuştin. Li Misirê ji ber heman sedemê şahidê sê kuştinên din bû: Xulûd El-Seyîd Hesen hate xeniqandin, Selma Mihemed û Emanî Ebdulkerîm El-Cezar hatin derbkirin.
Ciwana bi navê Meryem Mihemed ya ji Sûriyê ji hêla zilameke Urdinî di dawiya sala 2021`an de hate kuştin ji ber heman sedemê. Çîrok dişbin hev, di sala 2022`an jineke ji Cezayîrê ku navê wê Rîma Enan ji aliyê cçranê xwe ve hat şewitandin.
Tevî ku hin sûcên kuştinên jinan eşkere bûne, lê bi sedan dozên kuştinê jinan hatine veşartin û di tarîtiyê de man e.

### Zarok jî ji van sûcan bêpar neman e

Li Misirê sûcên li dijî zarokan jî nû zêde dibin, tevî ku sûcdar li xwe mikur tê jî lê parastina wî tê kirin.
Li bajarê Xisûs ya parêzgeha Qeylûbiyê ya Misrê , di 27 Îlona 2024'an de zarokek 11 salî ji hêla bavê xwe ve hate kuştin, bi henceta ku bê agahiya wî ji malê derketiye ji bo ku bi zarokan re bilîze. Di lêpirsîna tîma lêkolînkirinê ya bajarê Xisûs li parêzgeha Qeylûbiyê, hate aşkerekirin ku piştî kuştina vê zarokê nîşanên îşkence û şewitandinê ser laşê wê hate dîtin. Bav hate girtin û ew birin midûriyeta polîsê, li wir ew li sûcê xwe mikur hat.
Li Cezayîr di 26'ê Îlona 2024'an de, zilamek ji Qestentîniyê du keçên xwe ku temenê wa 18, 26 salî ne kuştin, berî wê jî ew li xwe migur hat ku di sala 2009`an de wî hevjîna xwe jî kuştiye.
Li Sûriyê bi taybet li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan jin ji ber êrişên dagirkeriya Tirk jiyana xwe ji dest didin. Weke Bêrîvan Mihemed ku di encama bombebaran balafirên keşfê yên dewleta Tirk a li ser Çapxaneya Sîmav a ku pirtûkên dibistanê çap dike, jiyana xwe ji dest da.
Li herêmên dagirkirî(Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê û hwd..) ji hêla çeteyên girêdayî dewleta Tirk, sûcên revandin, îşkencekirin, destavêtin, zewicandina bi zorê û kuştin derheqê jinan pêk tê. Lê tevî van sûcên hovane jinên li herêmên dagirkirî li dijî zilmê radibin ser piya û serî hildidin ji bo mafê xwe, weke bûyera ku li gûndê Kaxirê yê Efrînê pêk hat, çeteyan êrîşî jinan kirin, di encamê de gelek birîndarên jin derketin û çend jin jiyana xwe ji dest da. Mîna vê bûyerê ku li herêmên dagirkirî pêk tê der heqê jinan dijî mirovahiyê ne, gerek civaka navdewletî û rêxistinê mafên mirovan herwiha rêxistinên jinan detswerdanê bikin, mafên jinan misoger bikin û sînorekî ji çeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker deyne û dagirkeriyê bi dawî bikin.

### Bûyerên îşkenceyê

Ji bilî van sûcan jî bi hinceta şerefê tên kuştin. Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê çend bûyerên wiha derketin pêş, weke bûyera (Jina Til Simen) ya bajarê Reqayê, ku berî çend mehan bûyer çêbibû, di riya Vvdyo li ser medyaya civakî hate parvekirin çawa jineke ciwan ku temenê wê 18 sal derbas nekiriye, li hember îşkenceya fîzîkî tê ji hêla malbat wê bi hinceta Şerefê, lê ji hêla gel hate xelas kirin û rakirin nexweşxaneyê, di encamê de gelek




şikestin di laşê wê de çêbû, ev bûyer hêrseke mezin li gel civakê çêkir û banga muhasebekirina tawankaran hate kirin.

### Kuştina di bin navê şerefê

Di sala 2021`an de jî li gundewarê bajarê Hesekê jineke ciwan bi navê Ayde El-Hemûdî El-Seîdo bi temê 16 salî ji hêla malbata xwe hate kuştin li taxa Zihûr ya bajarê Hesekê bi hinceta şerefê. Ev bûyer di riya fîdoyoyekê ku malbata wê belege kirbû û li ser medyaya civakî hate parvekirin, di fîdiyoyê de hate aşkerekirin çawa birayên wê bi riya mîtralyozekê wê dikujin, piştî ku wê dibin ciheke dûrî malê.
Ev sûc pêk hate di bin navê Şerefê, ji ber ku jina ciwan red kir ku pismamê xwe bizewice.
Ev bûyer hêrseke mezin di nav bikarhênerên medyaya civakî de çêkir, di nava daxwazên cezakirina hemû kesên ku bi kuştina wê hatine tawanbar kirin, ne tenê ew kuştin lê kêliya ev sûc pêk anîn kişandin û li ser malperên medyaya civakî parve kirin.
Mîna van bûyerên ku me li jêr aniye ziman, bi hezaran jin her sal tên kuştin, her sal hejmar zêdetir dibe, lê ji ber heman sedemên hatin diyarkirin tên kuştin.
Ji dîroka desthilatdar û baviksalar de, jina bedew, xweşik, afrîner, xuleqkar û hwd… bû amûra zordestan, ev yek li tevahî cîhanê bûye modela modernîteya kapîtalîst û şêwazê sereke ji bû tunekirin û kolekirina jinê. Ji 5 hezar sal û heya niha her cûreyê işkence, kuştin, destdirêjî, zewcandina bi temenê biçûk li ser jinan tê meşandin û ev yek bûye çanda cîhanê, lê berdewamî ji vê riyê re nemaye, êdî hizireke nû ji bû jinê derketiye pêş vê modêlê, ew jî modêla jiyana azad û wekheve ya ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye pêşkêşkirin. Êdî jin nema jina berê ye ku ji her cûreyê işkenceyê re nebêje na, êdî ala têkoşînê bi şoreşa jinê bilind dibe. Dibe ku işkence û tundiya li ser jinê bidawî nebûye, lê têkoşîna jinê jî ji vê işkenceyê mezintire.

# ‘Serêkaniyê parçeyek ji canê me ye’

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

**Koçberên Kampa Serêkaniyê diyar kirin ku 5 sal in Serêkaniyê hatiye dagirkirin, 5 sal berxwedanî di bin şert û mercên herî giran û zehmet de tê kirin û gotin, “Axa me parçeyek ji canê me ye û em tu carî dev ji parçeyê canê xwe bernadin her wê bimîne cih û warê me.”**

Piştî dagirkirina bajarê Serêkaniyê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê ve, şêniyên van bajaran ji ber hovîtiya çeteyan bi darê zorê, ji cih û warên xwe hatin derxistin, lewre Rêveberiya Xweser ji bo bicihkirina van malbatan, kampa Serêkaniyê ava kir.
Ev 5 sal in Serêkaniyê hatiye dagirkirin, 5 sal berxwedanî di bin şert û mercên herî giran û zehmet de tê kirin. 5 sal konên koçberan nehatine guhertin, di zivistan û havînan de jiyana wan ne ti jiyan e. Tevî ku Rêveberiya Xweser li gorî derfetên xwe hewl dide bi koçberan re bibe alîkar, lê jiyana koçberan di nava kampê de zehmet e. Herwiha koçber hemû astengî û zehemtiyan bi têkoşîneke mezin derbas dikin û hêviya vegera mal û milkên xwe jiyan dikin. koçber êş, zor û zehmetiyên ku îro li kampê dikşînin hevkarên dagirkeriyê berpirsyar in.
Derbarê rewş û berdewana li kampa



**Mêrvet Xidêr**



**Sedîqa Muslim Hesen**

Serêkaniyê, Koçberên Kampa Serêkaniyê ji rojnameya me re axivîn.
Kobera bi nave Mêrvet Xidêr diyar kir ku ji hovitiya êrişên dagirkeriyê ew neçarî jiyana li kampê bûn û wiha got: “Ez ji gundekî girêdayî navçeya Tiltemirê me û niha li kampa Serêkaniyê jiyan dikim. Dema êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser bajar û navçeyên me pêk hatin, em neçar bûn berê xwe bidin bajarê Hesekê. Li Hesekê di dibistanan de bicih bûn, lê nedibû ku em demek dirêj di dibistanan de bimînin ji ber hejamara me zêdebûn lewra Rêveberiya Xweser ji me re kampa Serêkaniyê ava kir û ev 5 sal in em ji cih û warên xwe derketine. Her kes dizane jiyan kampan bi çi rengiye, gotin tenê têra şîrovekirina astengiyên jiyana koçberiyê nake, ne jî êş dikare bê xuyakirin, di axa xwe de em bûne koçber, dagirkerî û çeteyên wê ne tenê me dûrî malên me kir, me dûrî parçeyeke ji cane me kir, ji ber mirov cihê ku lê jiyan dike, mîna zarokê xwe dibîne, zarok jî pareyeke ji canê dayikê ye, niha jî canê me birîndar e, lê çawa ku dayik çiqasî dûrî zarokê xwe dikeve û hizkirina wê zêdetir dibe, cih û warên me jî her wê bimîne parçeyê canê me, çiqasî me dûrî wê bikin her em ê hev bin û hêviya ku parçeyê canê me vegere û kêfxweşiya jiyanê vegere qut nabe. Di heman demê de berxwedaniya me ji komployên ku li ser me tên meşandin, mezintire.”

### ‘Ne havîna me havîne û ne zivistana me zivistane’

Mêrvet Xidêr di berdewamiya axaftina xwe de anî ziman ku kamp bi her awayê xwe zehmete û wiha got: “Di nava kampê de hin rêxistinên cîhanî zembîlên xwarin û paqijiyê mehane li me belav dike, lê em bêjin nebêjin ew têra me nakin û bi zor û zehmetiyan em xwe dighînin serê mehê. Di heman demê de ne havîna me havîne û ne zivistana me zivistane, ji ber di dema havînî germahiyeke wê ya zêde heye, him toza li kampê jî, ji bo tenduristiya me nebaşe, ya herî girîng jî kesên temen mezin germahiya zêde ji bo wan zehmet e. Li kêlek wê di demsala zivistanî de sermaya zêde heye, rêjeya sotemeniya ku li me tê belavkirin têra me nake, ji ber kon ne mîna xêniyane, serma xwe lê digire, herwiha çûnûhatina li kampê ji ber barîna baranê dibe asteng. Daxwaza û hêviyên min ji rêxistinên navneteweyî yên perpirsên kempane ku guhdanên zêde ji kampê re bê kirin û rewşa me binerin ku em bi ci awayî jiyan dikin.”

### ‘Serêkaniyê cihê derguşa şarestaniya me ye’

Mêrvet Xidêr axafrina xwe wiha qedan: “Êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam dikin û plana wan ew e ku hemû bajarên me dagir bikin. Ew dixwazin demografiya herêmê biguherînin û projeya Neteweya Demokratîk têk bibin. Dewleta tirk hewl dide hemû bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir bike, lê bi saya berxwedaniya me û ya zarokên me heya roja îro planên dagirkeriyê têk çû. Lewma niha dixwazin carek din êriş bikin da ku cihên din jî dagir bikin, hem jî qirkirineke çandî li ser me pêk bînin, lê bera xwen û xeyalan ji xwe re ava nekin, Serêkaniyê cihê derguşa şarestaniya me ye, warê Rustem, Egîd û lehengan e, Serêkaniyê bi tenê namîn e, em 100 sal din jî, jiyan bikin, her em ê ji bo Serêkaniyê jiyan bikin.”

### ‘Ka mirovahî ka wijdanê mirovan’

Koçbera bi nave Sedîqa Hesen jî diyar kir ku ew ji bajarê Kobanê ye lê 30 salan li Serêkaniyê jiyan dikir û wiha got: “Ez ji bajarê Kobanê me lê 30 salan me li Serêkaniyê jiyan dikir. Piştî ku Serêkaniyê hat dagirkirin, em derbasî kampa Serêkaniyê bûn, di kampê de hewcedariya me bi gelek tiştan heye, bi taybetî 5 sal in kon nehatine guhertin û ev dibe sedema nexweşiya gelek zarok û jinan. Bi hatina baranê re gelek kon li ber avê dirin. Ma ka mirovahî ka wijdanê mirovan, pêwîste her kes alîkariyê bide koçberan û bêdengiya xwe bişkîne. Em baş dizanin çi li dora me dibe em nayên xapandin. Ya ku xwedî li me derket Rêveberiya Xweser e, ya ku kamp ava kir û me bi cih kir ew e, ne rêxistinên mirovî ne ku tenê bi axaftin dibêjin em mafên mirovan diparêzin, lê daxwaza min ji wan ew e ku gotin tenê nemîn e û bi erkên xwe yên mirovî rabin.”



# ‘Kenan Şêxo mîrasa Mihemed Şêxo vejand’

**Hunermend Kenan Şêxo birayê biçûk ê hunermendê kurd Mihemed Şêxo ye. Bi dirêjahiya 10 salan xebata hunerî li Rojava û Başûrê Kurdistanê, hem jî li derveyî welat kiriye. Herwiha Biha Şêxo girêdayî Kenan Şêxo da zanîn ku Kenan bi deng, bejin û bala xwe mîna Mihemed Şêxo bû.**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Dema ku navê ‘saziyeke hunerî’ tê gotin, yekser dezgeheke ku mijûlî kar û xebata hunrê tê xeyalê mirov, lê bi gotina navê Mihemed Şêxo, Biha Şêxo û Kenan Şêxo bi tena xwe dibistaneke hunerî dikeve bala mirov. Ev malbat ji mezin ta biçûkê wan hunermend in û muhra xwe li huner û çanda kurdî dane û li ser asta Kurdistanê hatine naskirin. Yek ji hunermendên vê malbatê Kenan Şêxo ye, girêdayî jiyan û xebata wî ya hunerî, birayê wî Biha Şêxo ji rojnameya me re axivî.

### Jidayikbûn û aliyê civakî yê Kenan Şêxo

Biha Şêxo têkildarî xwendin û zaroktiya Kenan Şêxo wiha got: “Birayê min Kenan Şêxo di 1968’an de li gundê Xirbê Kuma ji dayik bû. Ev gund dikeve başûrî gundê me yê bi navê Xecokê yê ku em lê bi cih dibûn. Lê dema ku em ji ber karê çandiniyê li gundan digeriyan, Kenan li wî gundî hate duniyayê. Em di nav malbatê de 6 xuşk û 6 bira bûn, Kenan jî birayê me yê herî biçûk bû. Dema em vegeriyan gundê Xecokê, Kenan çû dibistanê û li gundê xwe, xwendina seretayî qedand. Her wiha ji ber ku wî gelekî ji xwendinê hez nedikir, li aliyekî din jî rewşa malbata me di milê aborî de lawaz bû, xwendina xwe nedomand. Lewma jî wî zaroktiya xwe di nav gera li gundan de derbas dikir. Ew mîna Mihemed Şêxo û bavê min bi bejin û bala xwe dirêj bû. Raste di zaroktiya xwe de dirêj bû, lê tevger, terz û danûstandinên wî yên zarokan bû. Hertim darqewzik(çetel) di destê wî de bû û timî li nava gund digeriya. Carekê dema ez ji karê leşkerî vedigeriyam mal, nemir



Mihemed Şêxo ji min re got “Ez nema dikarim ji ber gazinên cîranan li mal bimînin, hertim tên gazinên Kenan dikin.”

### Kenan û kêliyên hunerî bi malbatê re

Şêxo girêdayî hunera Kenian a ku mîna mîrasekî ji malbatê wergirtibû wisa bi lêv kir: “Huner di nav malbata me de mîrateyeke, bavê min dengbêj bû û stran digotin. Ti caran hunermendekî ne Mihemed Şêxo, ne Kenan û ne ez jî me fêrî stran û amûrên muzîkê nekiriye. Lê belê em di malekê de bûn û ji hev fêr dibûn û her yek ji me bi tena xwe perwerde dikir. Ji bilî wê jî di nav gera kar de, dema em çûn devera Tilbirak, di sala 1973’an de bi malbatî me kasêtek çêkir. Di wê kasêtê de bavê min, Mihemed Şêxo û malbat tev stran li nav bembo digotin. Kenan jî di wê kasêtê de bi temenê 5 salî bi me re stran digotin, lê wî bi awayekî jixweber distrand. Piştî Mihemed Şêxo çû ser dilovaniya Xwe, ji nişka ve wî dest bi hunervaniyê kir, Kenan xwe fêrî tembûr, cumbuş, ûd û kemanê kir, pê re jî stran digotin. Taybetmendiya Kenan Şêxo hebû ku dengê wî, bejin û bala wî mîna ya Mihemed Şêxo bû. Heta niha gelek hunermendan stranên Mihemed Şêxo gotine lê yê ku dikarî tam mîna wî bistrê Kenan bû. Dema ku Mihemed Şêxo sax bû, me nedît ku Kenan rahiştiye tembûrê û stran gotine. Ew timî ji Mihemed Şêxo ditirsiya û nêzî wî nedibû, lê bandora hunera Mihemed Şêxo û bavê min gelekî li hunera Kenan hebû.”

### Xebata hunerî di nav civaka kurdî û komên Rojavayê Kurdistanê de

Birayê Kenan, Biha Şêxo xebata wî ya hunerî ya di nava gelê kurd û komên Rojava de wiha anî ser ziman: “ Piştî Mihemed Şêxo di 1989’an de koça dawî kir, Kenan rahişte sazê û dest bi hunerê kir. Di destpêkê de li nav civatan û bi hevalên xwe re stran digotin, bi demê re jî çû cem nivîskar, helbestvan û rewşenbîrên kurd û hewl da ku stranên taybet çêbike. Pê re jî di hin komên hunerî û folklorî yên Rojavayê Kurdistanê de xebata hunerî kiriye. Weke koma Narîn li Tirbespiyê, koma Agrî ya Amûdê û hwd… di nav van koman de bi erkê tomarkirina kasêtan jî radibû. Hem jî li şahiyan stran digotin, carekê jî ew çend kesên din bi koma Narîn re li çemê Cerahê dema şahiyek li dar dixist, ji aliyê rêjîma Bais ve hat girtin û çend rojan di zindanê de me.”

### Gera wî ya hunerî li Başûrê Kurdistanê û dîlgirtina wî…

Biha di derbarê çiwîna Kenan a ber bi Başûrê Kurdistanê û dîlgirtina wî de wiha axivî: “Di sala 1992’yan de derbasî Başûrê Kurdistanê bû. Dema ku çû wir jî xelkên wê Duhok, Hewlêr û deverên din bi coşeke mezin Kenan pêşwazî kirin. Sedem jê ew bû ku berê xelkê Başûrê Kurdistanê ji Mihemed Şêxo hes dikir. Lewma jî ji gelek şahî û ahengên hunerî li piraniya bajarên Başûr li dar xistin. Her wiha di wan şahiyan de gelek stranên Mihemed Şêxo û gotin û strana min a bi navê Xecxecokê jî gotibû. Demeke dirêj di ser vê yekê re derbas nabe û bi awayekî nediyar digihêje Mûsilê, serweriya wê demê ya hikumeta Îraqê bû. Ew ji aliyê hikumeta Îraqê ve di heman sala çûyîna xwe de hat girtin û ew radestî rêjîma Beis kirin. Kenan Şêxo salekê di zindana rêjîmê de bû, lê piştî ku ji zindanê gavên cuda avêtin. Ew î êşa zindanê û hunerê ya salekê bi riya ahengan anî ser ziman û di warê stranan de gav avêtine pêş. Di sala 1996’an de wî bi hevkariya koma Buhar kasêteke xwe derxist, wî stranên Mihemed Şêxo gotine, hem jî stranên xwe û stranên hunermendên din bi awazên xwe gotine. Di sala 1997’an de zewicî û piştî salekê berê xwe da wargehê xerîbiyê.”

### Çûyîna Elmaniya û domandina xebata hunerî

Şêxo têkildarî çiwîna Kenan Şêxo û domandina xebata hunerî li gel Hunerkom û koma Berxwedan de wiha axivî: “Di sala 1998’an de Kenan Şêxo biryar da ku koçî Almaniya bibe, lewma jî di wê demê de çû û li wir xebata hunerî domand. Ew tevlî Akademiya Hunerkom û koma Berxwedan bû. Ev herdû komên hunerî girêdayî Mediya TV û Roj TV bûn, di nav wan koman de hunermendên kurd ên navdar mîna Seydxan, Şemdîn, Xelîl Xemgîn û hwd… hebûn. Dema ku Kenan çû Almaniya, hin stranên Mihemed Şêxo bi xwe re birin, dan Mediya TV û wê jî dan Navenda Çandê ya Mezopotamiya. Kenan û hunermendên girêdayî koman, bi hev re berhem diafirandin û belav dikirin. Bi dirêjahiya du salan xebata hunerî Kenan li Almaniya û Belcîka bi koman re kir. Gelek caran wan hunermendan bi hev re stranên Mihemed Şêxo digotin û tomar dikirin. Lê em nizanin ku Kenan ti kasêt an stran di wê demê de tomar kirine yan na. Ji xwe rexneya me ji Mediya TV, Roj TV û koman re heye ku ji dema Kenan çûye ser dilovaniya Xwe hîna wan carekê Kenan di salvegerên koça wî de, bi bîr nexistine. Her wiha eger berhemên wî li gel wan hebin jî, heya niha dernexistine û belav nekirin. Hetanî ti xwestek an helwesteke wan di derbarê karê hunerî yê Kenan de nehatiye nîşandan.”

### Mirina wî û Mihemed Şêxo bi heman awayî bû

Hunermend Biha girêdayî mirina Kenan wiha eşkere kir: “ Di 25’ê Pûşbera 2000’î de Kenan Şêxo bi kirîza dil çû ser dilovaniya Xwed. Di wê rojê de ew û hevjîna xwe mêvanên maleke Êzîdî bûn, Kenan nexweş bû, lê ji bîr kirbû ku derman bi xwe re bibe. Di encamê de di demjimêr 4 û nîvê sibehê de ji jiyanê koç kir. Mirina Kenan û mirina Mihemed Şêxo heman sedem bû û di heman demê de bû, Mihemed Şêxo jî di demjimêr 4 û nîvê sibehê de bi kirîza dil koça dawî kir. Nexweşiya wan jî mîna hev bû, nexweşiyeke hevbeş û heman taybetmendî bûn. Ew jî nexweşiya Marfan bû, nexweşî dikeve damarên dil de, damaran fireh dike, eger ew nexweşî derman nebe, mirov temenê 40’î derbas nake. Ew nexweşî, gewdeyê mirov dirêj dike, lê temenê wî sînordar dike. Di encamê de jî Kenan û Mihemed Şêxo bi vî rengî ji jiyanê koç kirin. Piştî ku Kenan mir bi heftiyekê gihaşt bajarê Qamişlo û li goristana Hilêliyê bi coşekê ji gelê kurd, malbat û hevalên wî hat oxirkirin.”

# Bi koma ku ava kiriye jinan bi erdnîgariya Kurdistanê tîne cem hev

Atiya Abdulrahman a ji Silêmanî bi “Koma geştiyar a Jinên Kurdistanê” ya ku bi xwe damezrand, jinan ji malên wan derdixe û wan bi erdnîgariya Kurdistanê tîne cem hev. Jinên Kurd ji bo çanda Kurdî derbasî nifşê nû bikin rola sereke dileyîzin. Atiya Abdulrahman a ku mamosteyek ji Silêmaniyê ye piştî 6 salan li derveyî welat ma û vegeriya welat bi armanca danasîna çand û erdnîgariya Kurdistanê “Koma Geştiyar a Jinên Kurdistanê” ava kir.

### ‘Her jin dikare tevlî gera me bibe’

Atiya Abdulrahman a ku temenê wê 77 salîye, di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Ez hewl didim jinan ji malên wan derxînim û bi geran xwezaya Kurdistanê bi wan bidim naskirin.” Atiya Abdulrahman wiha berdevam kir:
“Dema ez zivirîm Kurdistanê fikrek min ya avakirina komekê hebû. Ji ber vê min di sala 2010’an de heremên Kurdistanê nas kir. Ji bo bi min re biçin herêmên cuda yên Kurdistanê û derveyî welat min komek jinan ava kir.her jin dikare bibe endamê koma me û tevlî gera me bibe.”
‘Ez bi cilên xwe yên gelerî gelek welatan geriyam’
Atiya Abdulrahman diyar kir ji zaroktiya xwe ve ji cilên gelerî hezdike û wiha pê de çû: “Dema ku dayik û bavê min ji min re cilên gelerî dikiriyan min xwe gelek pîroz hîs dikir. Rûxmê ku ez bi salan li derveyî welat mam min çand û zimanê xwe parast. Ez gelek welatan geriyam û hêz û îradeya jina Kurd da nasîn. Ez li gelek welatan bi cilên Kurdî geriyam.”

### ‘Em dixwazin di navbera jinan de têkîliyek xurt bidin avakirin’

Yek ji endama komê Basoz Ehmed ji Zaningeha Mûsilê ya ji beşa Îngîlîzî xêlas kir ye. Basoz Ehmed da zanîn ku armanca lidarxistina gerê ji bo jinan ew e ku di navbera jinan de têkiliyeke xurt were avakirin û ji bo pêşxistina çanda Kurdî tevkariyê bike û wiha got: “Em dixwazin jin



di nava aşitî û yekîtiyê de jiyana xwe bidomînin û desthilatdariya mêrsalar baş nasbikin.”
Yek ji endamên komê çalakvana sivîl Şoxan Mehmûd jî got: “Em weke endamekî vê komê bi saya hêz û îradeya jinan serdana xwezaya bedew a Kurdistanê dikin. Ez gelek kêfxweş im ku gelek geştên xwe bi vê komê re dikim.” **NÛ JINHA**

# Êşa herî giran koçberiya di hundirê welêt de ye!

Koçberên li Kampa Waşûkanî di nav êş û zehmetiyan de jiyanê dewam dikin, êşa koçberan jî ne jiyana li nav konan e, lê birîna wan ew e ku di welatê xwe de bûne koçber. Di heman demê de koçberî bandoreke mezin li ser piskolojiya wan kiriye û ev yek hîn zorê dide jiyan wan.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Bi salvager Komploya Navneteweyî ya ku li ser Rêber Apo pêk hatî, dewleta Tirk êrişî Serêkaniyê û Girê Spî kir. Piştî êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên ku di sala 2019'an de li ser bajarê Serêkaniyê û Girê Spî pêk hat û ji ber giraniya bombebaranê şêniyên bajêr koçberî bajarê Hesekê bûn û neçar bûn ku hin ji wan di dibistanan de bic bibin û hin ji wan herin gel xizmên xwe. Lê mixabin dagirkeriya bajarên wan dirêj kir û heya niha jî bajarên wan di destê dagikeriyê de ye. Ji ber wê hewcedariya koçberan bi cihekî hebû, lewra Rêveberiya Xweser ji wan re, kampa Waşûkanî û Serêkaniyê dan avakirin. Kampa Waşûkanî di sala 2019'an de li bajarokê Tiwêna ku 12 km li Rojavayê bajarê Hesekê dikeve, hate avakirin. Di kampê de ji aliyê Rêveberiya Xweser ve binesaziya bingehîn ji gel re hat amedekirin, çadir û depoyên ava vexwarinê hatin dabînkirin, erd ji hev hat veqetand, toreya elektirîkê di kampê de hat belavkirin û kamp li ser komînan hat dabeşkirin. Di nava kampa Waşûkanî de 2 hezar û 260 malbatin, ji wan 4 hezar û 200 jinin, 3 hezar û 600 mêrin, 8 hezar û 226 zarokin, 16 hezar û 26 kesin ku di 1 hezar û 993 çadiran de bicih bûne.

Kampa Waşokan heyanî sala 2023'an jî, ji aliyê UN'ê ve ne naskirî bû û ne jî weke kampeke fermî hatibû erêkirin, ji ber vê yekê xizmetên wê, tenê bi dabînkirina hin konan sînordar bû, lê piştî çend mehan hin rêxistinan mudaxele kirin û destek dan ji bo pêşkêşkirina xizmetguzariyê ji koçberan re.

**Rêxistinên ku di warê tenduristiyê de li kampê dixebitin wiha ne:**

Heyva Sor a Kurd, Rêxistina Rîlêf, Rêxistina IRC, Rêxistina SP û Rêxistina HI. Ji aliyê van rêxistinan ve guhdana tenduristiyê ya destpêkê ji koçberan re tê kirin.

**Rêxistinên ku di warê perwerdeyê de dixebitin:**

Di kampa Waşûkanî de 3'ê dibistan hene û di wan dibistanan de minhacê Rêveberiya Xweser tê dayîn. Herwiha ji aliyê navenda Rêxistina NRC ve ji bo xurtkirina xwendekarên li dibistanê û yên dev ji xwendinê berdidin perwerde tê birin.

**Rêxistinên ku di warê parastinê de dixebitin:**

Rêxistina Aştiyê, Rêxistina Nûdem û Rêxistina Rîlêf. Herwiha ji aliyê rêxistina ACTED ve rêvebirin û çêkirina pêwendiyan ji bû dabînkirina xizmetguzariyên av û paqijiyê li kampê tê kirin. Di heman de ji aliyê rêxistina Save The Children ve beşên xwarinê li dayikên ku şîr didin zarokên xwe, tê belavkirin. Û rêxistina CHF parê xwarinê mehane li koçberan belav dike. Komela Elmewede jî, bernameya jêhatîbûnên jiyanê ji bo ciwanên kampê pêşkêş dike û diyariyên mehane li wan belav dike. Herwiha ji aliyê tenduristiya cîhanê û UNICEF'ê ve kampanyayên hişyariyê yên derbarê nexweşiyan û derzîlêdana rûtîn a zarokan tê kirin.



Macid Ebdulqadir

Di kampa Waşûkanî de car caran ji aliyê hin rêxistinan ve, hewcedariyên kampê an jî ziyanên ku gihiştine koçberan û binpêkirinên ku di encama dagirkirinê de gihiştiye wan, tên şopandin. Û hin projeyên xizmetguzariyê wek avakirina cihê serşoştinê, danîna kevirê şikestî li riyên di nava kampê de, danîna lempeyên ronîkirina kolanan û pêşkêşkirina derfetan ji bo karker û pêşeyên ku li kampê ne.

**Pêwîstiyên herî girîng ên kampa Waşûkanî**

-Berfirehkirina dîwarên kampê ji bo bicihkirina malbat û zewacên zêde.
-Avakirina cihê xwaringeh û serşoştinê ji bo her kon a çadirekî pêwîste.
-Birêxistinkirina kenalên avqirêjiyê di nava komînan de ji bo rijandina ava şûştinê.
-Piştgiriya warê tendirustiyê bi rêya navenda tenduristiya zanînê û peydakirina dermanan, bi taybetî dermanên nexweşiyên giran.
-Rêxistinkirina tora elektrîkê bi stûnan di kampê de, herwiha teore û qutîkên elektirîkê ji bo ewlebûnê.
-Paqijkirina dîwarê kampê.
-Danîna batonê li binê konan û lêkirina derdora wê bi 4 rêz ji bilokan ji bo parastina konan ji baranê.
-Pêwîstiya her malbatekê bi cihê xwaringeh û serşûştinê yê taybet heye, ji ber piraniya pirsgirêkên kampê ji ber hevbeşbûna cihê serşûştin û xwaringehê ye.
-Çêkirina qada lîstikê bi hemû pêdiviyan.
-Girîngî û piştgiriya dibistanan di warê lojîstîk, qirtas û kincên yekreng de.
-Guhertina hemû konê di kampê de.

Di derbarê kar û xebatên Heyva Sor a Kurd û Rewşa dibistanan di nava kampa Waşûkanî de, rêveberê Heyva Sor a Kurd a li kampa Waşûkanî Macid Ebdulqadir, endama Heyva Sor a Kurd Ahîn Osman û yek ji mamosteyên dibistanên li kampê Rûken Izo ji rojnameya me re axivîn.

Macid Ebdulqadir diyar kir ku bi avabûna Kampa Waşûkanî re navenda Heyva Sor a Kurd li kampê hat avakirin û wiha got: "Heyva Sor a Kurd, ji destpêka avakirina kampa Waşûkanî ve li kampê bi cî bûye û li koçberan xwedî derdikeve. Di nava navenda me de kilînîk hene, ew jî kilînîka Zarokan, Kilînîka hundirîn, kilînîka jinan, piştgiriya piskolojîk, teqîgeh, dermanxane û embulansek ji bo rewşên lezgîn 24 seatan amedeye û nexweşên ku rewşên wan zehmet bin, ji nexweşxaneyên taybet ên bajarê Hesekê tên şandin. Ji xwe me ya odeyek emliyatan li bajarê Qamişlo heye, dema rewşek bi hewcedarî emliyatê be, em hemahengî bi wan re tê dikin û heger dikarin vê rewşê pêşwazî bikin em ji wan re, rê dikin. Ji milê dermanan jî tu kêmasî tuneye û em bi hemî derfetên xwe dewl didin ku pêdiviyên jiyanî ji koçberên kampê re bi cih bînin. Di heman demê de ji ber Kampa Waşûkanî kampek vekiriye, lewra çi rewşên ku derbasî kampê bibe em wek Heyva Sor ku bi erkekî mirov radibin bi wan re dibin alîkar. Rêxistina me bi hemû derfetên xwe yên heyî, hewl dide ku pêwîstiyên koçberên ji Waşûkanî û gundewarên wê ku li kampê dimînin, bi cih bîne. Xebatên me jî, ji aliyê 43 endam tê meşandin."



Ahîn Osman

**'Li heman welatî koçberbûn birînek e'**

Endama Heyva Sor a Kurd a li Kampa Waşûkanî Ahîn Osman diyar kir ku piştî gel ji bajarê xwe koçber bûn êş û azarên wan zêdetir bû û wiha got: "Jiyana li kampan bi her rengê xwe zehmete, koçberî êş û azarê koçberan zêdetir kir. Ji ber vê yekê me wek Heyva Sor a Kurd hewcedarî bi vekirina piştgiriya piskolojîk di navenda Heyva Sor de dît. Dema ku gel ji bajarê xwe derketin û derbasî nava konan bû, ji bo wan êşek bû. Êşa koçberan ne jiyana li nav konan e, lê birîna ew e ku wan di welatê xwe de, bûne koçber. Bandora Koçberiyê herî zêde li zarokan bûye, ji ber zarok bûn qurbaniya polîtîkeyên dagirkeran, ev jî derûniya wan xerab kiriye. Di heman demê de ji ber koçberiyê derûniya jin û mêran jî xerab bibû, ev jî dibû sedema nefêkirin û pevçûna di nava malbatê de. Lewra me girop dan avakirin û ji wan giropan re piştgiriya piskolojîk çê dikin. Herwiha rêzgirtin di navbera dê, bav û zarokan de nemabû li ser vê bingehê me rûniştandin ji dayikan re çêkirin, ji ber rêjeya mêran kêm dihatin û di wan rûniştinan de rê û rêbazê çareseriyê nîşanî wan dida."

**'Rewşên piskolojîk li cem koçberan bi sedema koçberiyê ye'**



Rûken Izo

Ahîn Osman axaftina xwe wiha qedand: "Rûniştandinên ên ji bû dê û zarokan di çarçoveya ku çawa ji hev fêm bikin, ji ber dema zextên piskolojîk li ser dê hebe nikare li zarok û derdora xwe guhdarî bike, lê dema dê nas kir rewşa ku ew têre derbas dibe, zarok jî di wê rewşê re derbas dibe, guhertina li ser wê li ser zarokê jî pêk hatiye û têgihiştina zarokê jî ne bi qasî ya dayikê ye, wê demê gihişt têgihiştinekê ku ew ê zarokê bîne derdora xwe ne zarok here derdora wê. Mêr jî, ji ber bêkariyê zext li ser tê kirin ev zext dibe sedema pirsgirêk û pevçûnên malbatî. Ji bû zarokan jî, rûniştandinên me ji zarokên temenê wan kêmî 10 sala ne heye, ew jî di çarçoveya hişyariyê ku çawa li derdor û paqijiya xwe guhdar bin, herwiha çawa danûstendinê bikin, hem jî em wan teşwîqî xwendin û çûna li dibistanê dikin, ji ber di dema niha de gelek zarok dev ji dibstanê berdidin, ev jî ji bû pêşeroja wan zirareke mezin e. Dema ku mirov di bin zextên biskolojîkê de be, çareserî li cem wan heye, lê ji ber zextan nabîne û di hizira wî/ê de ew tenê di vê yekê re derbas dibe, lê dema ku di rûniştandina de, li hev guhdarî dikirin, didîtin ku hemû di bin van zehmetiyan re derbas dibin, weke tê gotin dema ku tu felekta kesên din dibîne ya te hêsan dibe. Ji xwe ji bû van rûniştandinan demên taybet tuneye, her dem deriyên me ji bû pêşwazîkirin û çareserkirina rewşên wan vekiriye. Daxwaziya min jî ew e ku berfirehiyek mezin di Heyva Sor a kampê de ji bo çalakiyên ji zarokan re bê avakirin."

**'Hêviya me piştgirî ji bû xwendekaran'**

Rûken Izo diyar kir ku li kampa Waşûkanî 3 dibistan hene û wiha got: "Li dibistanên kampê danê sibeha û yê êvarî dewa lê tê kirin. Herwiha di dibistanê de mihacê Rêveberiya Xweset ji pêkhateyên kurd û ereb re tê dayîn. Ji bo şagirtên seretayî de her polek de mamosteyek erkdarê wê ye, lê dibistanên navîn û amadehî her biranşek mamosteyeke wê taybet heye. Tevlîbûna şagirtan ji dibistanê re kême, ji ber rêjeyek ji şagirtan dev ji dibistanê berdidin û diçin kar dikin, ji bû bi malbatê xwe re alîkar bin, lê ev zirareke mezin e, lewra em komîta ji bû vê yekê ava dikin. Asta xwendekaran li gorî rewşa ku tê de ne, bi giştî başe. Alîkariya ku bi şagirtan re tê kirin, pir kême, ji bo wê hêviya me ew e ku ji bû şagirtan piştgirî ji her alî ve bê kirin û dûrî xwendina xwe nekevin."

## Gurbûna şer û tirsa Tirkan



Hafiz Ahmet Turhalli

Li Rojhelata Navîn her ku derê şer û pevçun girantir dibin, ne tenê li Rojhelata Navîn, li Ukranya û Asya dûr jî dengên şerxwazan bilindtir dibe. Şere cîhanê yê sêyemîn her diçe giraniya xwe dide meşandin û dîtbarî dibe. Bi taybet neha jî li cîhanê agirê şerê cîhanê yê sêyemîn tê gurkirin û amadebaşiyên şer tên pêşxistin.

Li Rojhelata Navîn sala par di meha Cotmehê de bi êrîşa Hemasê li ser Îsraî'lê şerekî giran û kîret pêş ket. Fîşeka şer ya Hemasê ku tu berjewendiyên gelê Filîstînê tê de tunne bû, bû sedem ku Îsraîl dijî Hamas û Hizbulahê şerê tunnekirinê pêş bixîne. Mirov kare bêje, ev êrîşa Hemasê li ser Îsraîlê bi hevkarî û daxwaza Fesadên dewleta Tirk û Îraniyan pêk hat. Îsraîlê ku Hemas weke destê Îranê didît, bi vê êrîşa bi destê Hemasê, firsendekî zêrîn bidestê xwe xist. Bi destpêkirina vê êrîşê bi deh hezaran mirov hatin kuştin û Xeza hate rûxandin. Serokên Hemasê pêşengên wan û gellekî xelkê hêjar û bê guneh jî hatin kuştin. Hizbulahê ku bi nav û deng bû, qaşo xwedan hêz bû, kadirên wî û pêşengên wî, ji hêla Îsraîlê ve hatin yekalî kirin. Îran, Yemen û Lubnan jî tevlî vî şerê bûn. Îrana ku bi salane li dijî Îsraîlê amadekariya leşkerî, sîyasî û dîplomasî dikir, mirov kare bêje, hêza wê têrê nekir û şer hate ber deriyê Îranê. Eniya ku jê re dibêjin Hîlala şîîyan, ya hevkarên Îranê, Hemas, Hizbullah, Yemen, Sûriyê û Îraqê, neha dema xweya herî qels dijî. Dewleta Tirkan ku Hikumeta (AKP û MHP) ev çend salin ji şer û pevçunên herêmê sûd werdigirt, bi şerê Hemas û Îsraîlê re ew jî hate tengav kirin. Beriya vê şerî ge li hêla Emerîka, ge li hêla Rusan cîh digirt. Ji bo Kurd nebin xwedî statuyek her tiştên kîret bikar danî. Qaşo dijberiya Îsraîlê di nav xwede dikir û piştgiriya Hemasêjî eşkere dikir. Ji Îsraîlêjî bu, ji Ereban û îranêjî tiştekî bi dest nexist. Neha ji ber Îran ketiye devê tifingê, tirsê bi dewleta qirker girtiye! Dibêje ewê Îsraîl li Îranê bide, ewê Suriye bê hêz bimîne û ewê Kurd bibin xwedî statû. Ev axeftinên Bahçelî û Erdogan di derbarê çareserî û aşitiyêjî, ji vê tirsêne. Ger Îran têk biçe îcar dora meye. Lewre ew baş dizanin wan çi wehşet bi serê Kurdan anîne. Jiber wê dibêje hawar zu bikin Îsraîl hat ber deriyê me, ewê xaka mejî jime bigre. Digot Hamas jibo me kuwwaî mîllîyeye. Henekî kesên dînfroş jî, biwîre heman tişt digotin. Azadiya Kurdan û Kurdîstanê weke Îsraîla duyemîn propaganda dikirin. Hun van derewan bikin jî hunê têk biçin! Belê ewê gelê Kurd bigîhîje azadiya xwe! Hun çi defik û dolaban çêdikin bikin, ewê gelê me bigîhîje meqsed û miraza xwe.

Ayeta Qur'ana pîroz, Jibo xwedan maf û mezlûman:

Tê Bîra te? Neyarên te jibo te bê bandor bikin, an te bikujin, an jî te ji welatê te bi darê zorê derbixin defik çêdikir: Xwedê defikên wan xira dikir. Kesê herî baş û xweş defikan xera dike Xwedaye. (Enfal 30)

Belê de'fik û dolabên çêkirin, ewê bixwe têde bimînin. Ev jî zagona Xwedêye.



# 'Rizgarkirina Reqayê; ji tariyê ber bi ronahiyê ve

Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê a kantona Reqayê Zuleyxa Ebdê diyar kir ku rizgarkirina Reqayê ji çeteyên DAIŞ'ê serkeftina mirovahiyê û têkçûna tarîtiyê bû. Herwiha Zuleyxa destnîşan kir ku piştî rizgarkirinê bajarê Reqayê li ser fîkra Netewa Demokratîk û hevgirtina gelan ji nûve hat avakirin.

**Diyana Mistefa/Reqa**

Reqa yek ji bajarên Sûriyê yê herî mezin e û li ber çemê Feratê hatiye avakirin. Bajar xwedî cihekî stratîjîk û dîrokeke kevnar e.

Di sala 2011'an de bi destpêkirina kirîza Sûriyê bajar Reqayê ya ku di bin serweriya rêjîma Baas de bû, sala 2013'an kete bin serweriya komên çete. Sala 2014'an jî ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hat dagirkirin. Çeteyên DAIŞ'ê yên ku qaşo dixwestin li ser nîvê erdê Sûriye û Iraqê dewletekê ava bikin, Reqa jî qaşo xistibûn paytexta xwe. Çeteyên DAIŞ'ê li Reqayê bi çekên artêşa Sûriyê ku li pey xwe hiştibûn êrîş dibirin ser deverên din yên bakurê Sûriyê. Bajar di heman demê de xistibûn navendeke wehşetê û firotina jinên Şengalê yên ku revandibûn.

Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê bi piştgiriya Koalîsyona Navneteweyî di 6'ê Mijdara 2016'an dest bi pêngava bi nave Xezeba Feratê ya Reqa û gundewarên wê kir. Operasyon ji aliyê fermandareke jin de hat bi rêve birin.

QSD'ê gund û bajarokên li dora Reqayê di nava 8 mehan de hemû ji bin dagirkeriya çeteyan rizgarkirin. Tevî bi sedan gund û bajarok, hin deverên stratejîk yên mîna Kelha Ceeber, Bendava Feratê, Bendava Azadî û balafirgeha Tepqayê hatin rizgarkirin.

Di çarçoveya operasyona ku bi lez û serketî dewam dikir de, 21'ê Adarê ya 2017'an operasyona rizgarkirina Tepqayê destpêkir û 10'ê Gulanê bajarokê ku 40 km dûrî Reqayê ye hat rizgarkirin. Rizgarkirina Tebqayê ji bo rizgarkirina Reqayê jî gaveke girîng bû. Piştî 8 mehan êdî dor hate Rizgarkirina Reqayê. Di 6'ê Hezîranê de pêngava rizgarkirina bajêr ya bi navê Cenga Mezin destpêkir. Bajarê Reqayê ku bûbû sembola wehşet û tarîtiya DAIŞ'ê ji çar aliyan de hate dorpêçkirin. Yekîneyeke jinên Êzidî jî ji Şengalê di cenga mezin de cih girtin û bi ruhê tolhildana komkujiya Şengalê li dijî çeteyan şer kirin.



Cenga mezin ya ku di 6'ê Hezîranê 2017'an destpê kir roja 17'ê Cotmehê bi têk çûna DAIŞ'ê bi dawî bû. Di berxwedana 134 rojan ya Cenga Mezin de bi hezaran çete hatin kuştin û teslîm girtin. Her wiha bi deh hezaran sivîl ji bin zilma DAIŞ'ê hatin rizgarkirin. QSD'ê roja 20'ê Cotmehê bi merasîmekê mizginiya rizgarkirina Reqayê ji Cîhanê re ragihand.

Di nava heft salên dawiyê de bajarê ku bûbû sembola zilm, wehşet û tarîtiyê niha bûye bajarê sembola xwîşk û biratiya gelan û sembola demokratîkkirina Sûriyê. Ev heft sal e pêkhateyên Reqayê mil dane hev bajarê xwe ji nûve ava dikin. Di derbarê mijarê de hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê a kantona Reqayê Zuleyxa Ebdî ji rojnameya me re axivî.

Zuleyxa Ebdê diyar kir ku çeteyên DAIŞ'ê bajarê Reqayê veguherandibûn cihê zilim û wehûiyetê û wiha axivî: "Çeteyên DAIŞ'ê piştî dagirkirina Reqayê xwestin civakeke bê îrade, nezan û kole bikin. Bi taybet li ser jinan zilma herî giran dihat meşandin, jin bê Îrade man û di koletiyeke de derbas dibûn. Piştî dagirkirina Reqayê dibistan hatin girtin, xwandin, çand û her tişt tune bû. Herwiha keçên zarok dihatin firotin û zewcandin. Qedexe bû ku jin rûye xwe derxe yan jî li derveyî malê biaxive. Di heman demê de qedexebû ku jin bi tena xwe ji malê derkeve. Li ser vê bingehê civaka Reqayê nasnameya xwe winda kir, bi taybet welatiyên kurd bi giştî ji Reqayê hatin derketin."

Zuleyxa Ebdî axaftina xwe wiha domand: "Welatiyên Reqa bang li QSD`ê kirin da ku bajêr ji zilma DAIŞ'ê rizgar bikin. QSD`ê jî banga gelê Reqayê pêk anîn, piştî berxwedaniyekî dîrokî Reqa rizgar kirin. Di dema destpêkirina rizgarkirina bajêr de gelek ciwan û jinên ciwan yên Reqayê tevlî



nava refên QSD'ê bûn. Rizgarkirina Reqayê hat wateya ronîkirina tarîtiyê û serkeftina mirovahiyê. Piştî damezrandina Rêveberiya Xweser li Reqayê , tevahiya sazî, destgeh, meclis, komîn, zanîngeh û ...hwd hatin avakirin û hertişt hat rêxistinkirin. Civak li ser bingeha felsefeya Rêber Apo a Netewa Demokratîk û xwiş û biratiyan gelan hat birêxistinkirin, jiyan ji nûve hat avakirin."

Zuleyxa balkişand ser guhertina ku sîstema Rêvberiya Xweser di civaka Reqayê de da avakirin û wiha domand: "Piştî rizgarkirina Reqayê jinan di tevahiya qadan de cihê xwe girtin û bi roleke sereke dilîzin, ji bo pêşxistin û rêxistinkirina jinan perwerde tên dayîn. Sîstema hevserokatiyê jî hişt ku baweriya jinê bi hêza wê zêdetir bibe. Sîstema Rêveberiya Xweser guhertineke bingehîn di fikrê civakê de pêk anî û hişt ku civak pêşengiya jinê qebûl bike û destekê bide jinê. Di dema niha de bi dehan jin fermandar, hevserok û rêveberin."

Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê a kantona Reqayê Zuleyxa Ebdî axaftina xwe wiha qedand: "wiha axaftina xwe bi dawî kir û got: "Ji bo pêkanîna aştî, wekhevî û demokrasiyê, herwiha ji bo pêkanîna azadiya jinê em ê heta dawiyê berxwedanê dewam bikin û li dijî fikrê paşverû têkoşînê bilindtir bikin. Em soz didin şehîdên xwe ku heta dawiyê, em ê rêya ku wan bi xwîna xwe av da dewam bikin û xeyalên wa bêk bînin."

# Silêman Ehmed 362 roj in ji aliyê PDK'ê ve hatiye girtin

**Navenda Nûçeyan**

**Rojnamevan Silêman Ehmed 362 rojin ji aliyê PDK'ê ve hatiye revandin. Piştî 279 rojan ji rtevandina wî PDK'ê ew dadgeh kir û 3 sal cezayê girtîgehê lê birî.**

Rojnamevan Silêman Ehmed roja 1'ê Cotmeha 2023'yan ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Silêman roja 25'ê Cotmeha 2023'yan dema xwest derbasî Başûr bibe, ji aliyê hêzên PDK'ê ve hat revandin. Piştî hefteyek ji windabûna Silêman Ehmed, asayîşa PDK'ê ya Dihokê di daxuyaniyeke nerast de got ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed 'ne ji ber karên



wî yên rojnamevaniye' û bi eşkere gefa cezakirinê lê kirin û îtiraf kirin ku wî revandine. Herî dawî di bin zextên sivîl yên rojnameger, sendîka û rêxistinên li ser asta herêmî û navnetewî de, roja 22'yê Gulanê destûr hat dayîn ku parêzerên wî li girtîgeha Asayîşa Dihokê hevdîtinê pê re bikin.

Yek ji parêzerên Silêman Ehmed, Beşdar Hesen di derbarê hevdîtina li gel Silêman de agahî da ajansa ROJNEWS'ê û got: "Em bi Silêman Ehmed re li odeyekê rûniştin. Di hevdîtinê de Silêman Ehmed spasiya hemû kesên ku ji bo wî hewl dane kir û silavek taybet ji hemû xebatkarên Ajansa Rojnewsê re şand. Her wiha Silêman Ehmed spasiya hemû rêxistin, sendîka, rojnamevan û welatparêzan kir ku hewl dane wî azad bikin. Em gelek keyfxweşin ku me rewşa tenduristiya wî baş dît, tenê daxwaza wî ew bû ku heta serbest bê berdan zextên heyî berdewam bike."

Parêzer Beşdar Hesen tekez kir ku niha li gor madeya 1 a yasaya jimare 21 ya sala 2003 ya Parlamentoya Kurdistanê, ku girêdayî 'têkdana ewlekariya netewî' ye, zêdetir ji 7 mehane ji aliyê dadwer ve tê ragirtin û got; "Lê belê heta niha tu tomet li ser wî nehatine tesbîtkirin. Me parêznameya wî wergirt û piştre serdana dadwerê Dadgeha Lêkolînê ya Asayîşa Duhokê kir û got deriyê me ji we re wek parêzer vekirî ye."

Herî dawî 3'yê Hezîranê Dadgeha Sûc ya Yek ya Duhokê roja yekê ya rûniştina dadgehê ya Silêman Ehmed weke 30'ê Hezîrana îsal, diyar kir. Lê dadgehê bi hêceta dadwer ne amadeye û asayîşê kel û pelên rojnamevaniyê ne şandiye, danişîn ji bo 29'ê Tîrmehê hatibû taloqkirin. Di 29'ê Tîrmehê de Dadgeha Dihokê 3 sal cezayê girtîgehê li Silêman Ehmed birî.

Herî dawî Parêzerên Silêman biryar îtîraz kirin û dosyaya Silêman Ehmed radestî Dadgeha Temîzê kir. Parêzer Nerîman Ehmed got, dosya Silêman Ehmed li ber destê Dadgeha Temîzê ye û li bende ne ku biryara dawî li ser bide.

# Desthilatdarî û Rêveberiya Demokratîk...(1)

## Ji ramanê Rêber Apo

Ji bo çareserkirina pirsgirêkên bingehîn ên civakî di diyardeya rêveberiya civakî de jihevkirina şêweyên desthilatdarperest û rêveberiyên xweser ên demokratîk gelekî girîng e. Heta cudahiyên bi kok ên di navbera paradîgmayên herdu rêveberiyan de neyên jihevkirin û zelalkirin, çareseriyên bêne kirin bivênevê wê bi tevahî bêkêr bin. Rêveberiya civakî bi xwe heta bi awayekî azad neyê diyarkirin, pirsgirêkên din hemû wê di kêliya dawî de di nava bêçareseriya rêveberiyê de asê û pûç bibin, heta wê bi xwe re pirsgirêkan girantir bike. Eger hewce bike ku mirov mînakeke dîrokî bide, mirov dikare behsa ezmûna Sovyetê bike. Bi awayekî desthilatparêz nêzî diyardeya rêveberiyê bûn ev yek di têkçûna ezmûna Sovyetê de bi roleke diyarker rabûye. Di bingehê şoreşên serneketî de heman diyarde veşartî heye. Ev şoreş, yan bi ti awayî nikarîbûne xwe ji têgihiştina rêveberiya desthilatparêz qut bikin û di encama vê de bûne desthilatdar û riziyane, yan jî bi temamî diyardeya rêveberiyê li derve hiştine û bi vî awayî ber bi anarşîzma ferdî ve çûne û bivênevê têkçûn ferz kirine. Desthilatdariya dewletdar û hiyarerşîk destavêtiye diyardeya rêveberiyê û ev çavkaniya pirsgirêkên civakî ye. Heta ku dest neavêjin diyardeya rêveberiyê, wê çeloxwarî û berevajîker nekin, mêtinkarî û zordestî nikare xwe bi sazî bike, û ev diyarde bivênevê yan wê pêk neyên an jî wê demî bin. Rêveberî çiqasî bêne desteserkirin, çerx û mekanîzmayên mêtinkarî û zordestî jî wê li ser civakan ewqasî bê avakirin. Bi vî awayî jî mîna ku devê qutîka Pandorayê vebe, tevahiya diyardeyên civakî wê di nava pirsgirêkan de bixeniqin.

Nîzama civaka xwezayî bi rêveberiya hiyarerşîk xirabû û pirsgirêkên çavkaniya xwe xweza li van zêde bûn, bi vê re jî pirsgirêkên civakî yên navxweyî derdikevin holê. Pirsgirêkên di warê çanda maddî û manewî ya civakê de her diçin girantir dibin. Şerên di navbera klan û qebîleyan de dijwar dibin îşaret bi avahiyeke bi pirsgirêk dikin. Di cîhana zêhnî de têgînên bi nakok ên xwedayî û fikrên mîtolojîk ên derdikevin holê bi xwe pirsgirêkên civakî yên zêde dibin îfade dikin. Em van diyardeyan hemûyan dikarin di civaka Sumer de bi awayekî xurt bibînin. Şerê di navbera xwedayan de, ya rastî pevçûna di navbera xanedanên hiyarerşîk ên mezin dibin û rêveberên bajar-dewletê de li ser berjewendiyan in. Şerên desthilatdariyê yên di navbera salên 5000-3000 B.Z. de li Mezopotamya Jêr û paşê di tevahiya civakên şareza de bê dîtin, wê prototîpa pirsgirêkên civakî ên bi kok li ser bingehê nakokiya bajargund ('barbar') û lihevnekirinên çînî yên yekdestdariyên mêtinkar pêk bîne. Piştre bi tevahî şêweyên lihevkirinê û şerên civakî, pevçûnên hundir û derve yên bajar, çîn û dewletê yên derkevin holê, mînakên pêşî yên aştiyê li van deran têne ceribandin.

Tevî ku di nava dem û pêvajoyê de rêveberiya desthilatperest bi ser ketiye jî civak ti carî ji xwesteka xwe ya xwerêvebirinê negeriyaye û li dijî rêveberiya desthilatdar timî xwesteka xwe ya xwerêvebirinê mezin kiriye. Jixwe di dîrokê de rêveberiyên qebîle û eşîran şêwegirtina herî berfireh a civakan e. Ya ku qebîle û eşîran pêk anî bi xwe, xwerêvebirin e. Li şûna ku li ber rêveberiyên xerîb stûyê xwe xwar bikin, timî tercîh kirine ku bibin civakên koçer ên li çol û çiyan, li qelaç û zozanan. Çi dibe bila bibe ji ya xwe nehatine xwarê; qirkirin jî li ber çavan girtine, lê ji pêdiviya bingehîn a xwezaya civakî mafê xwerêvebirinê negeriyane. Qebîle û eşîr gelekî serwext bûn ku ji xwerêvebirinê bigerin wê nasnameya xwe ji dest bidin û êsîr bikevin. Diyardeya jê re dibêjin berxwedana barbaran li dijî bajaran di bingehê xwe de şerê qebîle û eşîran e ku ji mafê xwerêvebirinê nagerin û bergiriya nasnameya xwe dikin. Mirov bi awayekî berfireh dikare vê diyardeyê heta roja me ya îro bibîne. Di kevalên Sumeran de bi îfadeyên bi bandor û bi awayekî destanwarî qala êriş û berxwedanên li dijî Sumeran tê kirin ku qebîleyên çolê ango Aramîtan (qebîleyên Proto Ereb) ji Rojava û yên Hûrriyan (Proto Kurd) ji Bakur û Rojhilat bi pêş dixistin.

Pirsgirêka xwerêvebirinê ya komên qebîle û eşîran di pêvajoyên qewm, millet an jî gelbûnê de xwe weke demokrasiyê (bi Yewnanî tê maneya 'xwerêvebirina gel') bi gewde dike. Divê mirov demokrasiyê bi du xisletên wê bide naskirin:



Yekemîn, di naveroka wê de dijbertiya dewletbûn û bi sazîbûna desthilatdariyê ya li ser gel heye. Duyemîn, xwerêvebirina xwe ya ji rêûresmê mayî bêhtir bi xisleta tevlîkirinê gurçûpêç dike, bi vî awayî çanda civîn û guftûgoyê bi sazî dike, prototîpa parlementê pêk tîne û bi vî rengî wê tekûz dike. Xwerêvebirin weke xweseriya demokratîk tevlîbûna hemû yekeyên civakê yên pêwendîdar pêk tîne û bi sazî dike. Di vê mijarê de mînaka dîrokî ya bi bandor û bi belgeyên nivîskî, em di demokrasiya Atînayê de dibînin. Demokrasiya Atînayê bi sedema ku bi temamî ji koletiyê nikaribû bibihure demokrasiyeke temam nayê hesibandin. Lê ji ber ku di mînaka Spartayê de dewletbûnê qebûl nake dewlet nayê hesibandin. Ev mînaka balkêş a ji demokrasiya temam derbasbûna dewletê der barê demokrasiya rastî de îro jî gelek dersên mirov jê bigire hene. Demokrasiya Atînayê ji roja me ya îro re nirxên hiştine hene weke rasterast demokrasî, bi hilbijartinên salane destnîşankirina rêveberiyê û nedana ti xisleteke payeberz ji bo kesên neqandî, diyardeya rêveberiyê ya di fermana demokrasiyê de, çanda civînan a welatiyan tevlî guftûgoyên polîtîk dike ango wan bi awayekî perwerde dike. Hemin wekî din serhatiya bêhejmar civakên din a nenivîsandî heye û ya wan jî çandeke demokrasiyê ya bi heman rengî ye.

Ezmûn û tecrûbeyên dîrokî yên me hewl da bi kurtî bi mînakan nîşan bidin, bi awayekî berfireh hebûn û cudabûna diyardeya xwerêvebirin û demokrasiyê li pêş çavan radixin. Şêweyekî rêveberiyê ye ku rê nade desthilatdarbûnê, rê li ber pirsgirêkên civakî venake, firsendê nade derketina holê ya zordestî û mêtinkariyê. Gelekî girîng e ku mirov li dijî hewldanên rizandinê yên rêveberiya desthilatdar van xisletên bingehîn ên demokrasiyê û xweseriya demokratîk timî zelal bike û ji wan negere. Eger mirov demokrasiyê bike kirasê rewakirina desthilatdarî yan jî dewletê, ev xirabiya herî mezin e ku mirov bi demokrasiyê bike. Divê mirov ti carî demokrasiyê bi dewlet û desthilatdariyê re wekhev neke, nebîne. Eger bi vî awayî têgîn bêne tevlîhevkirin hingê ji pirsgirêkên civakî re çareserî nayên peydakirin û heta her biçe wê bikevin ser hev û zêdetir bibin. Demokrasiyên serwextbûna polîtîk û hestyariya exlaqî ya civakî timî li ser piyan zindî û geş dihêlin, ji bo pirsgirêkên desthilatdarî û dewlet dibin sedema çêbûna wan, qadên rastî yên çareseriyê ne. Em rejîmeke din a bi qasî demokrasiyê karibe bêyî şer pirsgirêkan çareser bike nabînin. Lê kengî xweşhalî û aramiya civakê bikeve ber derbên kujer ên dewlet û desthilatdariyê ango tehlûkeyeke bi vî rengî derket holê, demokrasî bi coş şer dikin û bi hêsanî jî têk naçin.

Di serdema modernîteya kapîtalîst de ji bo demokrasiyan û xweseriyên demokratîk tehlûkeya herî mezin ji desthilatdariyên dewleta netewe tên. Pirraniya dewletên netewe yên kirasê demokrasiyê li xwe dikin, navendîbûna herî hişk pêk tînin û bi vî awayî mafê xwerêvebirinê yê civakê bi temamî ji holê radikin. Hegemonya îdeolojîk a lîberal hewl dide vê xisleta dewleta netewe ya dijberî demokrasiyê, weke xisleta 'serdema demokrasiyê' bi hîle bide pejirandin û ji aliyê dewleta netewe ve înkara demokrasiyê weke serketina rejîma demokrasiyê tê qebûlkirin. Li hemberî modernîteya kapîtalîst pirsgirêka rastî ya demokrasiyan ew e, divê cudahiya xwe nîşan bidin û dev ji xisleta xwe ya tevlîkirinê û domdar bernedin. Heta hegemonya desthilatdarî û dewletê neyê ferzkirin pirsgirêkeke civakî ya ku demokrasî çareser nekin tineye.



## Siyaset, Heqîqet û Dewlet(Bahçeli)

**Ahmet Aktaş**

Ji bo ku dewleta tirka û bi taybetî jî siyaseta wê zelal were nas kirin, hema mirov bala xwe bide vê hilwesta dawî ya Devlet Bahçeli bes e.
Silav û destdayîna Devlet a ji Ozgur Ozel û Tuncer Bakirhan re, li salona Parlamana Tirkiyeyê balkêş bû.
Bêgûman bi axaftina xwe ya li gel Ozgur Ozel re, cewher û heqîqeta siyaseta xwe û dewleta xwe ya derewîn aşkere dida dest.
Bi kurtayî digot, "Ew gotinên min ên li civîna koma parlamenê ku ji bo te digot, tu jê nerihet nebe, jixwe ew siyaset bû…" û hwd!
Wateya vê gotina wî, aşkere mina ku bêje, "siyaset derew e, van gotinên em li dijî hev dibêjin hemû derewin û ji bo xapandina gel, civak û raya giştî ye"!
Jixwe tê zanîn, dewlet, bi gelemperî weke têgîn, saziya parastina mafên desthilatên civakê ne. Ne weke ku ew dibejin, "dewlet mafê civakê diparêze", na xêr berovajî, li dijî çîna bindest mafê çîna serdest(dewlemendan) diparêze.
Lê dîsa jî, çîna desthilatdar vî wechê xwe vedişêr in, bi giranî rûyên xwe yên derewîn nîşanî gel nadin û heke xeter nebe jî, di çarçoveya yasayên xwe yên burjuvazî de tevdigerin.
Belê dema tengav dibin û li ser xwe hilwestên xeter dibînin, êdî yasayên xwe jî nas nakin, binpê dikin.
Îca, nuha di hilwestên Devlet Bahçeli û Receb Erdogan de, diyar dibe ku pir tengav bûne, êdî bêhemdî xwe jî dikarin biaxivin, rûyên xwe yên derewîn û xapînok bidin der.
Jiber ku berî nuha, him li dijî CHPê him li dijî DEM Partiyê, gotinên nayên gotin digotin, bi zimanekî dujminkarane dipeyivîn. Belê hema ji nişka ve zimanên xwe guhertin û xwedêgiravî mîna "dostan" peyivîn Devlet û Receb!
Bêgûman kesê ku ev durûtiya wan nedît nîne.
Her wiha divê jibîr nebe ku van kesan, projeyên ji derve yên hegemonên cîhanê didin meşandin û lewma ev hilwestên wan, ne hema jixweber bi îradeya azad derketine holê!
Weke berê jî hatibû bahs kirin, ev proje di çarçoveya cenga 3yan a cîhanî de tê birêvebirin. Û şaxê wê yê Rojhilata Navin Dewleta Tirk(Receb û Devlet) û Dewleta Isarîl(Netanyahu) e. Dîsa divê were bîra me Receb, cîgirê Buch ê Projeya Mezin a Rojhilata Navîn bû!
Aliyek yê şerê 3yan ê cîhanê DYE û hevalbendên xwe be, aliyê din jî Rusya, Çîn û hevalbendên xwe ne. Her du alî jî bê navber, tevgêrên xwe berfirehtir û hewldanên xwe bi leztir dikin.
Di duvikê vê çarçowê de, wezîrê derve yê Îranê, piştî gera Iraqê, Libnanê, Ummanê, Suriyê û Siûdiyê, nuha jî derketiye gera diplomatîk ya Urdinê, Misrê û Tirkiyê.
Di heman demê de, Nêçirvan Berzanî jî, çar roj berî hilbijartinên Iraqê li cem Fermandarê xwe Receb Erdogan bû.
Li himber van her du aliyan, aliyê sisyan Tevgêra Azadiya Kurdistanê ye û ew jî, van hewldanan ji her kesî zelaltir dibînin û li ser rêya xwe ya sisyan tevdigere.
Li ser vê bingehê, lîstokên "pêvajoya çareseriyê ya nuh" tên nirxandin, Şoreşa Rojava dê were parastin û Pergala Imraliyê tê hilweşandin-Rêber APO azad dibe!



# 'Fikrê Rêber Apo dikare cîhanê ji nû ve ava bike'

**Birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Mihemed Ocalan diyar kir ku li hemberî sîstema işkence û qirkirinê ya ku li dijî Rêber Apo li Îmraliyê tê meşandin, pêwîste gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz rabin ser piyan.**

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Ji sala 2011'an ve tecrida girankirî ya li ser Rêber Apo bi şêwazekî din hatiye meşandin û veguherî sîstema işkence û qirkirinê. Piştî axiftina telefonê ya sala 2021'an, agahî ji Rêber Apo û hevalên wî yên di girtîgeha Îmraliyê de,nayê girtin. Piştî Erdheja ku li Bursa jî qewimî fikarên derheqê jiyan û tendirustiya Rêber Apo de zêdetir kir.
Têkildarî sîstema işkence û qirkirinê ya li ser Rêber Abdullah Ocalan tê meşandin, birayê wî Mihemed Ocalan ji rojnameya me ra axivî.

### 'Ev 25 sîstema işkence û qirkirinê li Îmraliyê didome'

Birayê Rêberê Gelê Kurd Rêber Abdullah Ocalan, Mihemed Ocalan di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Ji 15'ê Sibata 1999'an ve, dewleta Tirk ya dagirker şêwazekî



nû li ser Rêber Apo û dilgirtiyên siyasî dimeşîne. Asta îşkence û tecrîdê carna sivik dike, carnan jî giran dike. Ev dide xuyakirin ku li gor zagonên xwe nameşin. Hevdîtîna herî dawî ya li gel Rêber Apo ya wek malbat, di sala 2020'an de bû. Ti kesî bawer nedikir ku dewleta Tirk ewqas işkenceyê giran bike. Rêber Apo jî dibêje 'Siyaseta li gel dewletê ne hûn û ne Qendîl jî, dikare bimeşîne.' Rêber Apo dide xuya kirin ku tecrîda li ser wî tê meşandin lawaziya kar û xebatên kêmin. Yê herî zêde li gel Rêber Apo çûye hevdîtinê ezim. Ji ber wê ye ez jî lawaz mam. Min jî nekarî Rêber Apo baş bidim fêmkirin. Raste Tevgera Azadiya Gelê Kurd jî, me jî hin hewildanên giranbûha dan nîşandan. Lê ev têrker nebû. Weke kesayeta min jî, min nekarî di asta têrker de ji Rêber Apo fêm bikim û tecrîda girankirî bidin sekinandin."

### 'Li ser Malbata Ocalan jî tecridek tê meşandin'

Mihemed Ocalan axiftina xwe wisa qedand: "Bi avakirina Tevgerê û demên piştre izalasyon û zextek mezin li ser malbatê jî hat meşandin. Hertim endamên malbatê di bin zexta dewleta Tirk ya dagirker den e. Pergala dewleta Tirk ya dagirker ne me dikûje û ne jî destûr dide em jiyan bikin. Ji ber kuştin û qirkirinê zêdetir zextên taybet li ser malbatê tê meşandin. Rêber Apo tinebûn kire hebûn. Em jî pêwiste wek gel êdî rabin ser xwe û keda bi sedan salan vala dernexin. Rêber Apo ev sala 26'an di destê dewleta Tirk ya dagirker de dîl girtîy e. Pêwîste êdî em rabin serhilandanan bertekên xwe bidin diyarkirin. Ev 4 salin li Rêber Apo û hevalên li cem dimînîn ti agahî nayên girtin. Em ne wek malbat û ne jî parêzerên Rêber Apo bi ti awayî nikarin li gel Rêber Apo hevdîtin bikin. Em derheqê tenduristîya Rêber Apo metirsî jiyan dikin û bifikarin. Ev tenê ne wek malbat daxwaziya hemû gelên azadîxwaz e. Em niha nizanin Rêber Apo jiyan dike an na? Divê demildest agahiyek ji mere bê dayîn. Banga min ji bona hemû gelên welatparêz e ku ji bona tecrida li ser Rêber Apo û aloziyên ku herêm di bin de maye, bêdeng nemînin. Li ser wê bingehê em Komploya 9'ê Cotmehê a 1998'an şermezar dikin û ji hêzên navnetewî dixwazin ku bi erkên xwe rabin."

# Mala Barzanî ne tenê Kurdistan firotine, xayinê mala xwe ne jî!

**Volqan Elî**

Wêje û edebiyata gelan her tiştê wan e. Mîrasê wan ê dîrokî di wir de veşartî ye. Gotinên pêşiyan jî ji vê beşeke biçûk e. Çawa ku gotineke pêşiyên Xwecihiyên Emrîkî (Çermsorik, dibêje; "Me daristanên welatê xwe ne ji bavpîr û dapîrên xwe mîras girtiye, ji zarok-neviyên xwe bi deyn girtiye." Em zanyar û aliman kêm nabînin lê piştî vê gotinê, tu hezar ekolojîstan li hev kom bikî û nizanim çend pirtûkan binivisîne jî, encax karibin hevsengiya di navbera civak û xwezayê de evçend bînin ziman. Jê re şîrove û nirxandin ne hewce ye.
pêşiyên me Kurdan jî xwe ji kesekî nehiştine. Ji bo ku zarokên wan di tariyê de nemînin, rêya pêş xwe ronî bikin û li 'gur' û roviyan neqelibin, dema hal û waxta wan di cih de bûye yan jî beriya ku biçin ser dilovaniya xwe hin hosî û şiret li wan kirine. Bi dehan û bi hezar sal hin ji van, wekî kevirên li aşan digerin hema wisa di cihê xwe de rûniştîne û em zarokên wan îro ji wan re dibêjin, gotinên pêşiyan. Mînak, li cem me Kurdan gotinek heye dibêje; "Mala xwe şewitandiye ku mişkê di mal de bikuje". Şîroveya vê çawa dibe? her hal pêşiyên me bi sedan sal, bi hezaran sal jiyan şopandine. Dema dîtine ku kesek dixwaze xwe ji belayekê xelas bike, lê xwe li belayeke mezintir diqelibîne dest pê kirine û vê gotinê dihonînin.
Bi heman rengî, em li gotinên pêşiyên Xweciyên Emrîkî bizivirin. Her hal kesek ji wan, di xewna xwe bi şev de ev gotin nebihîstiye. Dîtine ku her tiştê wan ji daristanê ye, pincarên ku dixwin, giyayê ku sewalên xwe pê xwedî dikin, gelek amûrên pê debara xwe dikin, sewalên nêçîrê hemû ji dar û daristanan e; ew gotina xwe ya li jorê honandine.
Em dîsa li Rojhilata Navîn li Kurdan vegerin; gotinek pêşiyan heye dibêje; "Ji hesp daket û li kerê siwar hat". Ev gotin kengî tê gotin? Dema ku yek bi daxwaza xwe û bi zanebûn ji rewşeke baştir, xwe bîne rewşeke xirabtir, layiqê vê gotinê tê dîtin. Pêşiyên me yên gorbihuşt di van rewşan de ev gotin bi ser hev ve anîne. Naxwe, eger kesek ne Pêxember be yan jî ne filozof be, nikare gotinên wisa ji dîrokê re bimînin, bikin. Her bi vî rengî, dema yek bê wext karekî bike yan jî qonaxên xebata xwe baş rêk û pêk neke, pêşiyên me gotine; "Ga nekiriye, afir jê re dikire". Jixwe her



gel, her civak xwediyê vê gencîneya (xezîne) hêja ye. Li gorî dem û dewranê, li gorî erdnîgariyê, ferq û cudahiyek heye. Mirov nikare vê înkar bike. Dîsa jî ji ber ku ji bo hemû netewe û civakan heqîqeta jiyanê, cewhera jiyanê yek e, ziman û gotin cuda bin jî her gel-miletî pêşeroja nevî û hezar nevîçîçirkên xwe bi van gotinan wekî tava li azmanan be, ronî kiriye; bes dema ku nevîçîçirkên wan, wan ji bîr nekin yanê li wan xiyanetê nekin!
Me Kurdan gotinek pêşiyan heye, dibêje "Rih dibe bihost lê dijmin nabe dost". Her hal ti kes wê dînitiyê nake û nekiriye jî, ku bêje "ka em vê gotinê pêşiyan şîrove bikin, gelo wan xwestiye çi bêje". Ruxmî vê hin kes, hin hêz derdikevin û dibêjin, "ez ê ji dijmin feyde bikim, ew duh dijmin bû, îro ne dijmin e, ew dijminê nizanim kîjan partiyê ye, lê ji bo malbata me baş e, ez ê wan bi kar bînim û hwd", yan ji siyaset û polîtîkayê ti tiştî nasnake, bi goristana pêşiyên xwe dilîze û yan xiyanetkarên pir jîr û jêhatîne.
Mînak, Mala Barzanî van her du mercên ku me li jorê anîne ziman pêk tîne. Xwendekarê wê bêjin; "ma tu dibêjî ji her duyan yek, çima her du bi hev re. Gunehê vê Malbata navborî çima ew çend giran dikî?" na, van tiştan ez nabêjim! Jixwe, ew jî van tiştan nabêjin. Ma kî dibêje "Wele dewê min tirş e"? Lê niha pratîk û karê Mala Barzanî li Başûr dike ev bi xwe ye. Gotineke pêşiyên gelê Tirk heye. "Eynika yekî/ê kar û xebata wî/ê ye; li gotina wan nenêre". wekî vê gotinê; niha gelê Kurd ne li gotin û medyaya Mala Barzanî dinêre, li kirinên wan dinêre.
Ne bi gotina vê hêzê nizanim kîjan partiyê, ne bi gotina Mala Barzanî! Niha li Başur, beşeke girîng a Behdînanê di binê potînên leşkerên Tirk û DAIŞ'ê de ye. Ma Mala Barzanî dikare ji Tirkan soz bigire ku ew ê sibê li şûna Mele Mistafa, Mistefa Kemal bi cih nekin û cihê cenazeyê Mele jî dagir nekin? Ji ber wê yekê ye ku Mala Barzanî bi karê ku kirine hem welat firotine, xiyanet kirine û hem jî ji siyaset û polîtîkayê tu tiştî nizane!

FENER



## Eger Ne Eşkere û Fermî Be, Dolma Baxçeyek Nû Ye

**Idrîs Henan**

Di heyameke wisan gerim û tevlihev de ku nexşeyên herêmê ji nû ve, bi zorê, têne xêzkirin û hemû asîmanên dewletan li Rojhilatan Navîn bi fûze, balefirên şer û yên kişfê hatine qetandin, pirsine gelek mezin tên pirsîn û her aliyek li cihê ku karibe bandortir be digere. Bê guman şerê heyî bi destarê desthilatdariyê têye gerandin û hêrandin. Her aliyek, qewmek, heyînek li berjewendiya xwe digere û li gorî wê jî stratejî û hevalbendiya xwe destnîşan dike. Yek ji faktorên sereke yê di navenda vî şerî de cografyaya Kurdistanê û gelê Kurd e. Ji bona ku gelê Kurd carek din nebe qurbanê berjeweniya aliyên dagirker û mêtinger, vêca neçare ku bibe xwedî statu û dest vala dernekeve. Ji bona wê jî, yekîtî, itîfaq û felsefeyek şoreşgerî li ser hîmê azadî û demokrasiyê hatibe avakirin hewceyeke man û nemanê ye. Nexwe dê carek din di nav agirê vê gengeşeya mezin de bişewite.
Çendîn zanebûna vê yekê ji bona misogerkirina azadiya Kurd girîng be, ewqas jî ji bona xeta ajantiya Kurd û hevkariya bi dagirkeran re girîng e. Ji ber vê çendê, îroj xeta azadiya Kurd rûbirûyê xeta şerê taybet a xweradestkirinê ye. Parallel têkoşînek mezin têye meşandin. Aliyek xeyalên azadiyê hene û aliyê dîtir jî xeyalên desthilatdariyek mayînde hene.
Di nav vê şêl û bêla li herêmê diqewime de, hinek berdevkên faşîzmê derketine qadê û behsa aşîtiya navxweyî ya bi Kurdan re dikin. Hinek propagandeyan belav dikin ku qaşo hema li ser rêya Îmraliyê ne! Ya rast ew e; Eger bixwazin bi Serokatiyê re hevdîtinan çêbikin, ya rast dê ew be. Lê tu nahêlî parêzer û malbat biçin gel Serokatiyê û nahêlî agahiyek jê bê wergirtin! Diyare ku provakasyonek nû di dewrê de ye. Milekî van gotinan davêjin meydanê û milekî êrişî gel dikin. Dêmekî tiştekî fermî ta niha nîne, kengê parêzer resmî sardana Îmraliyê bikin, wê çaxê mirov dikare qala diyalogekê bike. Îca bi zanebûn ajîtasoyneke wisa bi pêş dixin mirov dibêje qey heyranên aşîtiyê ne? Di rastiya wê de tehrîkek heye ku dixwazin siyaseta Kurd a bi pêşengiya Rêber Apo bi pêşketiye sabote bikin û nehêlin doza Kurdan sûdê ji firsend û astmosfera heyî bibîne. Eger ne eşkere, zelal, fermî û li ber raya giştî belgekirî be, herikînek di cokên xefkên şerê taybet û Dolma Baxçeyek nû ye. Her gotin û idîayên derveyî fermiyetê jî ne dirust in.
Pratîka li ser erdê semîmiyeta wê gotegotê vala derdixîne. Eger mirov çavekî li mitînga Amedê ya Azadiyê bixe, binçavkirina dayîkên aşîtiyê û êrişên bi hemû cureyên çekan li ser Herêmên Parastina Medya heya Rojava, Bakur û Rojhilatî Sûriyê were, mirov dê baş têbigihjêje ka çiqas xwedî daxwazek dirust in?
Polîtîkayek şantajê bi qasî berjewendiyên wê yên demkî dide meşandin e. Xuyaye tu ders ji wan polîtîkayên pê wendakiriye negirtiye û hewl dide bi durûtiyê xwe ji bobelata Rojhilata Navîn desthilatdariya xwe xilas bike. Lew re jî vê nêzîkatiya xwe ya durû ku li ser tunekirin û qirkirina Kurdan ava kiriye, li ser her kesî ferz dike. Ji bona wê jî hemû çavkaniyên xwe xerc dike û pozisyona xwe girêdayî projeya tunekirina gelê Kurd bi kar tîne.
Gotinên Erdogan ên di derbarê metirsiya li ser Tirkiyê baş hestên wî yên jidestçûnê rave dikin ku mecbûrî itîfaqekî hundirîn û lihevhatinek neteweyî ye. Lê dîroka desthilatdariya faşîst li Tirkiyê pratîka wê ya roj îro piştrast dike ku heya jê were dê hewl bide atomsfera heyî bi navê aşîtî û diyalogê biçewsîne ku hîna jî difikire wê bi keştiya xwe ya kun, rol û misyoneke nû ya hêzê werbigire?!